Newroz Hejmar (71) Rûpel (11) Berçele 2006z – 2618k

Ûsivê Hersan
Nivêsakarê HAWAR ê yê dawî ye

Husên Ehmed

Werger ji zimanê Erebî: NEWROZ

Amûda bavê Mihemed, Amûda ku bi agirê zikreş û kîndaran di dîroka xwe ya nûjen de bêtirî carekê hatiye sot û wêrankirin, rojekê ji rojan, serê xwe ji dijminên rastiyê re ne tewnadiye, sitem û zordestî ne pejirandiye, her û her wê li ber xwe daye, herdem, beşdarî di xebata netewî, wêjeyî, çand û zimanê kurdî de kiriye.

Amûdê, vî bajarokê bi gewd û qilafetê xwe biçûk, lê bi dan dahênanên xwe mezin. Amûda çavreş, gelek lehengên netewî afirandine ku, di warê xebata netewî de bûne stêrkine geş û bi ronak, bûne mûm û find, xwe şewitandine û riya gelê xwe ronî kirine. Yek ji wan lehengan, ÛSIVÊ HECÎ HERSAN e, yê ku 71 salî di ber doza gelê xwe ya dadmend û rewa de, kar û xebateke bê westan kiriye.

Li gundê **Sêmitika Newaf**, yê nêzîkî Amûdê, sala 1918-an ji dê û bavekî kurd ew ji dayik bûye. Dê û bavê wî, hêj berî danîna sînorên Sûriyê ji gundê **Darê** hatibûn gundê **Sêmitik**.

Ji biçûkaniya xwe ve, Ûsivê Hersan, bi derd û êşekên gelê xwe hest bû, bi lez û bez, barê kurdewariyê hildigre ser milên xwe û dest bi têkoşênê dike. Di rêxistina **Xoybûnê** de ya ku di 28/11/1927-an de hatibû damezirandin û Dr **Ehmed Nafiz** birayê Dr.**Nûredîn Zaza** rêvebirya şaxê Cizîrê dikir, dibe endamekî zîrek, milê xwe dide milên xebatkarên kurd ên navdar mîna **Osman Sebrî**, (**Qedrî beg**, **Ekrem beg**) lawên **Cemîl Paşa** yê Diyarbekirî, **Hesenê Dêrikî**, **Reşîdê kurd**, **Cegerxwîn**, **Seydayê Tîrêj**...û hwd, dest bi karê rêzanî dike.

Sala 1935-an, li rex xebata xwe ya rêzanî, **Ûsivê Hersan** dest bi xebata çandî jî dike, gelek berhem û gotaran di kovara **Hawar** û **Ronahî** de ewên ku **Mîr Celadet Bedirxan** sala 1932-an li Şamê çap dikirin, weşandine.

Di gotara xwe ya bi navnîşana " Gelo Izrayîl dijminê kurda ye?" li ser derd û tewanbariya li gelê kurd seranserî Kurdistanê dibû nivîsandiye. Herweha, wî bi navê xwe yê eşkere gelek gotarên rêzanî di kovara **Stêr** û **Roja Nû** de, yên **Mîr Kamîran Bedirxan** li **Bîrûtê** çap dikirin nivêsandine.

Ûsivê Hersan, li gel nivîskar û rêzanên kurdan yên mîna **Mele Hesenê Hişyar, Qedrî Cemîl Paşa, Ebdurehmanê Eliyê Ûnis, Ekremê Cemîl Paşa, Dr.Ehmed Nafiz, Arif Abas beg**, helbestvanê navdar yê ku " **Agirê Sînema Amûdê**" sala 1962-an nivîsandiye(**Mele Ehmedê Namî**), **Cegerxwîn, Reşîdê kurd û Osman Sebrî**...û hwd, ta sala 1940 î, xebata wêjeyî berdewam kiriye.

Piştî ku parta demokrat a Kurdistan li Sûriyê sala 1957-an di bin bandora

D.R (10)